

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar (146) Sal 25 29ê Tebaxê 2020 z - 2632 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (100)L.S


# 6 sal di ser kuştara Şingalê re derbas bûne... Hê jî birîn vekirî ye!



## Desteya sernivîser

Roja 3ê Tîrmeha 2014an, di dîroka Kurd û cîhanê de rojeke reş, tarî û bêqidoş e, roja belavbûna şer û mirinê li Êzîdiyên bê sûc û bêguneh e! Roja vekirina birîneke kûr di laşê sinc û nirxên mirovatiyê de ye.

Di vê rojê de, keriyên hov ên rêxistina Daişê, bi têvedan, palpiştî û pilanên neyarên Kurdan, neyarên aştî û ronahiyê ji nişka ve, girtin ser gund, bajar û bajarokên Şingalê, bi kîn û zikreşî, sedên xotr û zilaman rêz kirin û ew gulebaran kirin!, keç, jin û zarok revandin, ji xwe re birin, keç û jinên êzîdî li bajarên mîna Reqa û Dêra Zorê hatin ..... 

❷

# Xebat ji bo berdewamkirin û serkeftina Diyaloga Kurdî-Kurdî

## Desteya NEWROZê

Roja Sêşembê 11.08.2020 z, şandeke hevbeş a PYDKS û PÊŞVERÛ hevdîtinek bi General birêz Mezlûm Ebbdê re pê kanî, du babetên sereke û giring guftugo kirin û ev daxuyana jêr ku ji zimanê Erebî hatiye wergirtin, ji raya giştî re belav kirin:

**Daxuyanî**

Li roja 11.08.2020z, şandeke hevbeş a serkirdayetiya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê(YEKÎTÎ) û Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê, ku ji van rêzdaran pêk hatibû:



Mihyedîn Şêx Alî/ Sekreterê PYDKS û Mustefa Meşayix/Cîgirê Sekreterê .....

❺

# Helbijartinên sexte!

**Mislim Şêx Hesen**

Li gor yasa û destûra her welatekî serbixwe, herêmên Federalîzim û herêmên otonomî her demekê li gorî zagona xwe ya hundirî helbijartinên nûneran çêdikin. Lewre jî pêwîst e ku, rewşa wî welatî an wê herêmê ji helbijartinan re amade be û heyam û merc jî guncaw bin, da ku, hemwelatî karibin rasteqîn bi awayekî demokratîk li gorî bîr û baweriyên xwe hilbijêrin. Da ku, ew nûner jî nûneritiyeke rewa û fermî di perlemanto de ji gel re bikin, û yasayên rewa derînin, gel jê sûd werbigre, û her wiha bervaniyê jî di ber gel de bikin, gava ku ziyan an azarek bi gel bibe, çimkî ew nûner bi dengên gel hatine hilbijartin.

Lê encûmena gel ya Sûriyê (ya ku damezirandina wê nêzîkî sedsalî bûye) wek hemî welatên cîhanê her çar salan li gorî destûr û yasyên xwe helbijartinan li dar dixe, bo ku hemwelatî nûnerên encûmenê an perlemanto di riya sindoqên dengdanê re hilbijêr in. Lê mixabin, piştî ku Partiya Elbe›is di sala 1963 an de bû desthilatdar, ew encûmen bû encûmena Partiya Elbe›is, ji ber ku tu wate ji wan helbijartinên ku her çar salan lidardixistin re nema, çimkî ew helbijartin bi awakî sexte û dûrî demokratiyê têne lidarxistin, û tenê kesên nêzîk Partiya Elbe›is bi riyên neyasayî derbasî perlemanto dikin.



Lê, ya kambaxtir ew e ku, li dema dawiyê sê helbijartin di karnava vê qeyrana awarte ku Sûriyê bi tevahî tê re derbas dibe de - tevî ku, şert û mercên helbijartinan ne gunçaw in, nimûne:

Nîvî gelê Sûriyê penaber e, gelek dever û herêmên Sûriyê dagîrkirî ne, û ji bilî wê jî şer rojane li piraniya bajarên Sûriyê rûdide - hatin lidarxistin. Vêca, mirov karê bêje ku rijîma Elbe›is (ya ku, nêzîk şêst salî bûye desthilatdariyê li Sûriyê dike) di siyasetên xwe yê çewt de berdewam e, û tu lêvegerê ji siyasetên xwe re çênake, û xuya ye ku, ti sûde jî ji rûxandina gelek bajar, nêzîk Milyonek kes kuştî, nîv milyon girtî, û 10 Milyon penaber wernegirtiye.

**6 sal di ser ... Dûmahîk**

firotin!

Di siha bîdengî, lalbûn û bêhilwestiya Cîhanê û dewletên mezin de, gundên êzîdiyan hatin talankirin û şewitandin, bêtir ji 68 navendên olî û şûnewarên bav û bapîran hatin rûxandin û bi xakê ve hatin dûzkirin!..Bêtir ji 4000 keç û jinên êzîdî ta vê rojê windayî ne, çarenûsa wan ne diyar e!.

Piştî xwendin û lîkolînên lêpirsînê, Yekîtiya Netewan, kiryarên Daişê yên hovane, weke tawanên li dij mirovatiyê pejirandiye, lê sed mixabin ku hê jî piştgirên rêxistina terorist berdayî ne, azad in, li gora dilê xwe çanda zikreşî, şer û mirinê hawîr belav dikin!.

Piştî 6 salan ji vê kuştara reş û 5 salan ji rizgarkirina Şingalê, hê jî bajar û gundewarê wê kavil û wêran e, bê jîn û jiyan e, dora (300) hezar êzîdî di bin konikan de dijîn, çiku gundên wan nehatine avakirin, hê jî aramî û hêminiyê di can û derûna wan de cih negirtiye!.

Li ser vê mijara dilêş, jineke êzîdî bi navê Hela Safîl ku ji destê Daişê hatiye rizgarkirin bi xemgînî û dilekî şewat dibêje:

«Jina êzîdî, toşî hemû reng û cûreyên aşkence û azaran bûye, mîna lêdan, destdirêjî û kuştinê!... Û her kêlîkek ku wê di girtin û dîlîtiyê de derbas kiriye, hemberî 1000 carî kuştinê ye!».

Di vê bîranînê de, pêwiste Hikûmeta Herêma Kurdistanê û Hikûmeta Federal a Îraqê ji bo nûavakirina gund û bajarên Şingalê gavên îjdil bavêjin, qerebû li wan bê belavkirin, da ku êzîdiyên di konikan de dijîn, vegerin gundên xwe, çandinî û jiyana xwe ya xwezayî bidomînin, çimku bersiva herî dirust li Daiş û xwişkên wê yên terorist re, man û girêdana bi axa welêt ve ye.


Bi şer, pevçûn û kuştaran, kirîzên cîhanê çareser nabin, pêwistya siyasetmedarên cîhanê bi danûstandin û diyalogê heye, di şer û kuştina mirovan de, şewitandin û wêrankirina welatan de, tu aqilmendî û berjewendiya gelan tune ye, lê berjewendiya bazirganên şer, febrîqeyên çêkirina çekên tevkuj têde heye.

Ev e 6 sal di ser kuştara Şingalê re derbas bûne, lê hê jî birîn vekirî ye!

# De ka em ji pendên mezinên xwe sûdan werbigirin

**Memê Alan**

Weke em zanin di nav tevahiya miletên cîhanê de pend û şîret di hemî warên jiyanê de hene, ew pend ne ji valahiyê derketine, hatine gotin û ji nifşekê derbasî nifşeke din bûne. Na, ew encama tecrûbe û ezmûnên jiyanê, binketin û serkeftinan ne. Di vê babetê de, bav, dê, bavpîr û dêpîrên me Kurdan jî, li dirêjiya sedsalan di gelek ezmûnên jiyanê û binketin û serkeftinan re derbasbûne, encam jê wergirtine, û weke pend û şîret li dû xwe hîştine, da ku, em sûdan jê werbigirin, ne tenê bibhîsin û hew. Ji wan pend û şîretên ji me re hîştine, ev du pendên jêrînin: «BAR KET JI XWEDIYAN MEKINTIR TUNE YE KU WÎ BARÎ HILGIRE» û «HÊKÊN XWE TEVAN MEKIN QUFEKÊ».



Ger em baş li van pendên jorîn temaşe bikin û bixwînin; Emê çi wateyê jê werbigirin, û çawa di xebata xwe ya di ber çareserkirina doza me ya Kurdî de li Sûriyê kêrhatinê jê bibînin? Bi baweriya me û li gor van herdu şîretan, em Kurd li Sûriyê miletekî xwedî dozeke dadmend û rewa ne, lê ev doz weke wî barê ketî, em xwediyê wê ne, û serdefter ji me tê xwestin berevaniyê di ber de bikin, û paşê jî dostan ji xwe re çêbikin, da ku alîkariya me bikin. Lê, mixabin tiştê li ser erdê heye, em ne li ser hev in, sê herêmên me (Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Sipî) di bin dagîrkeriya Turkiyê û nandozên wê de ne, kirîza Sûriyê ketiye bataqê û tu çareserî di asoyê de nayê xuyakirin, destêwerdanên herêmî (Turkiyê û Îranê) û navdewletî (Rûsiya û Emerîka) û her yek ji wan jî tenê li berjewendiyên xwe digere û ne xema me ne, bê garantî Amerîka û Rûsiya jî dixwazin me ber xwe rakêş bikin, Turkiyê û Îranê dixwazin me tune bikin, û rijîm û rikberiya heye jî dixwazin em radest bibin û bi wan re nebin hevpar. Vêca, li hember vê tabloya reş û tarî, û li gor şîretên ku, mezinên me ji me re gotine -Ger rast em bi doza gelê xwe re dilsoz in- gerek em bi şev û roj li ser van xalan bixebitin û katekê pêş de bi cih wînin:

1- Di nêzîktirîn dem de, em li hev bikin, hêzên xwe wînin ser hev, û lêvegereke siyasî ava bikin, da ku, em kanibin vî barî li erdê bi hev re rakin. Çimkî dem dibore, tirba me tê kolan, û belkîm wextek were lihevkirina me jî fêdê li me neke.



2- Çendî aliyên hundir Sûriyê çê yan xerab bin -dûr an nêzîk- em neçar in wan bipejrînin û li ser masakê li hev rûnin, û kêm an zêde pêşerojekê ji welatê xwe re ava bikin. Ji ber ku, xaknîgariya Sûriyê ji hev nayê qetandin û bila tu kes û alî me nexapîne, û em tu xewnan nebînin. Vêca, gerek em tim ji vê yekê re amede bin, û ne tenê weha jî, gereke em hewil bidin van têkliyan bi aliyên Sûrî re geş bikin, çimkî em û ew tenê xelkê vê welatî ne, û yên din ji derve hatine, kîjan rojê be, wê ji vir derkevin û domdar ji me re nabin pişt.

3- Halî hazir Turkiyê dewleteke dagîrker e, ji ber ku, beşek ji xaknîgariya Sûriyê dagîr kiriye û di nav de jî sê herêmên kurdî ne. Lê, nêzîk an dûr wê derkeve û vegere sînorên navdewletî, û di heman demê de jî em ji bîr nekin, ew dimîne dewleteke hevsînor. Û destêwerdana Îranê jî di Sûriyê de gerek were tunekirin. Lê, ta wê hîngê, divê em haje pilanên wan ên li dijî gelê me yê Kurd hebin.

4- Herdu dewletên zûlhêz Emerîka û Rûsiya yên xwedî rol di Sûriyê de, xwedî berjewendiyên pir û fere ne, ta niha bi temamî ji bo kirîza Sûriyê li hev nekirine, û her yek ji wan dixwaze bê garantî me bi xwe ve girê bide, û belkîm siba jî dest ji me berde, û nimûne jî gelek in. Çimkî berjewandiyên dewletan siyaset û dostên wan bêlî û sînor dike. Ji ber wê, gereke em hemî hêkên xwe tenê nekine selka yekî ji wan. Yanê gerek têkliyên me -kêm zêde- bi herdiwan re hebin, ji ber ku, pêşeroj ne zelal e.

Li dawiyê em karin bi kurtasî weha bibêjin: Neqşeriya rakirina barê me yê ketî di lihevkirina me ya bi lez de ye, di avakirina têkliyên biratî bi aliyên Sûrî re ji bo pêşerojeke çêtir ji hemî pêkhateyên wê re, di dûrketina ji hurhutandina Turkiyê û hewildana peydakirina aramiyê di pêşerojê de ye, û di dan û standina bi herdu dewletên xwedî bandor di Sûriyê de (Emrîka û Rûsiya) re ye.

# Gendelî Penceşêra civak û rêvebiriyan e

**Nûşîn Bêcirmanî**

Çi civaka hebe, siyasî, çandî, abûrî, leşkerî û her weha çi cureyên hebin, sedemên pêşketin û paşketina wan hene. Sedemên pêşketinê ku wê civakê serfiraz, hevgirtî û azad dikin, pêkhateyên wê jî aram, şad û bextewer bi hev re dijîn. Kar di civakê de tekûz û hêsan bi rêve diçe. Li beramberî wan, sedemên paşketinê jî hene, ku di civakekê de peyda dibin, ew civak di hemû milan de, qels û lawaz dibe, kar birêve naçe, civak jî di cihê xwe de pîkolê dike, endam jî li paş dimênin û bi lawazî jiyana xwe derbas dikin.

Diyar e, ku egerên paşketina civakan û rûxandina rêvebiriyan pir in, her yek ji wan, vê civakê lawaz dike, kar tim li paş dimîne, yasa binpê dibe, mafên civakê û kesan têne pêlêkirin.... Di serê van egeran de û ya herî zor, GENDELÎ ye.

Gendelî, ji mezintirîn nexweşiyên ku di civakan de peyda dibe, berê civakê dide, hejarî û lawaziyê, paşketin û têkçûnê!

Berî her tuştî, a herî giring, em danasîna gendeliyê bidin xuyakirin; gendelî çiye? Çawa peyda dibe? Encamên wê çi ne û çawa dê çareserî jê re were dîtin, da civak bibe civakeke saxlem û bi hêz.

Di gel ku gelek danasîn ji gendeliyê re hene, ji ber cureyên wê pir in, lê, em dikarin gendeliyê bi kurtî weha bidin nasîn, Gendelî: ( bikaranîna desthilatê bo havila taybet). Ev havila taybet, dibe ya kesane, rêxistin, girûp an jî ya partiyane be.

Temtêlên gendeliyê çine û çawa bikar tên?

1 – Gendeliya karmendên desthilatê û paşxistina rêdan û bidawîbûna karan demeke dirêj , xwestina pelik û emzeyên zêde ji bo karekî an rêdanekê.

2 – danîna kesûkûs û naskiriyên karmendên bilind û berpirsyarên asteya jor, di cihên karmendiyê yên bilind de, digel ku ew ne li gor wê berpirsyariyê ne.

3 – dana bertîlê ji karmendan re, bo bidawîkirina kar û daxwazên welatiyan di demek zû de û heye carna jê, ne ligor yasa û rewatiyê be.

4 – lîstika bi piştgirî û alîkariyên ku biryar hebe ji welatiyên perîşan re werin dan, ew alîkarî ji wan re nayê dan eger bertîlan nedin, di encamê de wê bigihê kesên nehewcedar yan kesûkûsên berpirsên wan alîkariyan.

5 – Bazirganiya ne rewa û qedexekirî ( Hîroyîn- Kokayîn- Çek...... ).

6 – Terxankirina qebe û ne rewa ji diravên dewletê re.

Bê guman dê ji bilî va yên ku li jor hatine diyar kirin temtêline din jî hebin.




Piştî me temtêlên gendiliyê nas kirin, pêdiviye em sedemên gendiliyê jî diyar bikin:

1 – Desthilata navendî, dest datîne ser zagonsazî, dadmendî û cêbecêkirinên hemû kar û mafan bi xwe ve girêdide .

2 – Terxankirina bilind ji diravên giştî re di piroje û karên bê encam û sûd e de, tenê ji bo derfet ji diziyê re ferehtir bibe.

3 – Bendkirina mafên dezgehên çavdêriya rêvebirî û diravî û encumena zagonsaz, ji bo ev encumen û dezgeh lawaz bibin û ji armancên xwe dûr bikevin.

4 – Nediyariya pirogramên zanistî di karê dezgehên çavdîriyê de, dê alikariyê bide karên ne durist di navçe û saziyên ku çavdêriyê li karê wan dikin.

5 – Lawaziya biryarên ku dermafê kesên gendelî li wan tekez bûye, têne standin. Ev jî dibe têvedanek ku jimara yên gendeliyê bikin bilind bibe, û çarçewên wê jî ferehtir bibe.

Gelo çawa em dê karibin rê le ber gendeliyê teng bikin da em wê ji holê rakin?. Bê guman ev jî pisporiyeke bêhempa jê re divê. Di baweriya min de, ev xalên jêrîn ku bikarbên, dê ji gendeliyê re çareseriyeke baş be.

1 – danîna sezakirineke tund dermafê kesên ku gendeliyê bikar tênin û dikin, ji bo rê li ber yên dîtir jî nemîne û ji tirsa sezayan, xwe dûrî gendeliyê bikin.

2 – hêsankirina yasa û biryaran di herem, dezgeh û saziyên rêvebiriyê de.

3 – Em berê xwe bidin zelalûnê (الشفافية) di hemû cihên desthilatê de, yên ku bi cemawer re peywendîdar bin, ji bo rê li ber bertîlan were girtin.

4 – Em rolekê bidin saziyên civaka sivîl ji bo diyarkirin û destnîşankirina rewşên gendeliyê .

5 – Danîna kesên hemkûf û pispor di wî kar û berpirsyariya ku jê re zana û pispor têne xwestin.

6 – Destnîşankirina asteyan ji fon û mehaneyên karmendan re .

7 – Vejînkirina rêzikên demokrsiyê û dûrketin ji biryar û fermandariya tekane û yek alî.

8 – Em pêwistiyê bidin aliyê sincî di danîna berpirsyaran de. Gendelî di destelat û rêvebiriyan de, nexweşiyeke herî zor e, weke nexweşiya penceşêrê ye, çendî em zû, berî ku belav bibe, wê ji kokê ve rakin, ew qasî baş e.

# Kurdên Baş Û Yên Ne Baş

**Mihemed Qer Hesen**

Gava çewsandarên gelê Kurd li her parçekî di tengiyê kevin, an jî dê pirojekê bimeşînin û bi cibicibikin, vedigerin vî hişî û gotekariya Kurdên baş û yên ne baş, ji ber ku Kurd di her çar parçan de ebir û pîvanên mîzînê ne. Loma zimanê xwe diguherin ji derve re xwe nerm dikin, û gelê Kurd dabeş dikin, Kurdên baş û yên ne baş. Bi nêrînên wan ên baş kî ne û yên ne baş kî ne. Kurdên baş, ewên ku guh li wan dikin û dikevin partiyên serdestan yên netewî, piroje û berjewendiya deshilatên zordar di nav Kurdan de pêktînin û cibicih dikin, li dijî doza gelê xwe radiwestin an jî jê bi dûr dikevin û li ortê radiwestin û mitan dibin. Gava ew li rex karê zordarên gelê Kurd radiwrstin, di çerx û feleka wan de digerin û dibin kelem li pêş tevgera kurdî, dibin hespên dijminên xwe, ew ji hêla wan zodaran ve tê pejrandin û pesnandin û dibin Kurdên baş. Ev tiştekî xwezaye ku di her gelekî de hinên wiha hebin. Lê gava pir bin bigihîne asteke beravêtina mafê gelê xwe tiştekî ne xwazaye, û divê rê li ber wan were birîn. Di dîroka xebata Kurdan nimûne pir hene. Li başûrî Kurdistanê ceşok hatibûn çêkirin. Û li bakurê Kurdistanê qurecî hatine çêkirin. Û li rojavayî Kurdistanê Be›sî û kesên bi şaxên asayîşa ve girêday hene. Zordarên Kurdan li pêş cîhanê dibêjin kurd li ba me wek birane û parek in ji hevhûndinda gelêrî û civakê ne, û hin kesan bi xwe girêdidin û dikin serokê hin dezgehan, û Kurdên li gor nêrînên wan baş wek rastîkê pêşkêşî komît û saziyên navnetewî dikin, ku ew xwedî mafin û nehatine zordarkirin. Li ba wan kurdên herî baş, ewên ku mirîne, çi bi laş, çi bi hiş. Lê Kurdên li gor nêrîna wan ne baş, serdefter doz û mafê gelê Kurd e. Ewên ku ji ber mafê xwe ve dixebitin, û doza wê dikin. Ewên ku kirar, nêrîn û dublumatîka wan riswa dikin û dicerisînin. Rûyê wan î hovane û rast ji der û hindir re aşkere dikin. Ewên ku can, hiş, mewal û demên xwe didin dozê ne… Ew gihêştine baweriyê ku nikanin gelê Kurd li xak û zemîna wan rakin û bipişfînin. Dixwezin Kurdan vê şiyan û hêz bikin. Dixwezin Kurdan ji hêzê û dezgehên rêxistinî vê par bikin, ji ber vê bi devikî dibêjin Kurd rindin, lê tevgera wan a konevanî ne rindin û li dijî welêt û parçekirina wî kar dikin. Di dîrokê de nas bûye ku netewek nikane vê tu sazî, dezgeh û rêxistinan bi serkeve, ji ber ku hêz û şiyana wan belav dibin. Loma ew şerê ramana rêxistin û sazîkirina gelê Kurd dikin. Ji ber vê çewsandarên gelê Kurd vê yekê napejrînin, wan weke xiniz, parçekirinê welêt û teror dibînin. Kar û xebata tevgera kurdî li derveyî yasayê û rewayên dibînin, û divê bi çi û awî be werin pelixandin, raku xêr, bêr û dewletên gelê Kurd ji wan tenê re bimînin. Loma ew Kurdên doza mafê xwe yê netwî bike, ewên ne baş in, û li ser wan xedar û bivene. Ev gotin û hiş li ba çewsandarên Kurdan wek alavek moralî li dijî gelê Kurd bi kartînin, û dikin ku wan dabeş bikin û ji hev bidizin û dara wan kurmî bikin. Ew li ba dilê xwe dibêjin ku karekî diblumatîk û piretîkî li dijî netewa Kurd bikartînin. Û yekîtiya Kurdan bi ser nekeve û bi hêsanî wan bişkînin. Divê bi çavekî çûçik li vê çekê netê nêrîn, ew lihevnekirina Kurdan wek rastîkê li dijî wan bikartînin, û bi dost û dijmên me re dibêjin, ku Kurd ne li gor maf û dewletê ne. Li hember hemî kirên dijmên Kurdan çeka her bihêz û xurt vîn, lihevkirin û yekîtiya wan e. Ev bi xwe re morala netewa gelê Kurd bilind dike û baweriya wî xurt dike, keys û derfetê dide ku dostên me çi li hindir, û çi jî li derve li kêleka mafê me bimînin û piştgirê bike.

---

**Xebat ji bo ... Dûmahîk**

Partiyê, Dr. Ehmed Berekat û Ehmed Silêman/ Endamên nivîsgeha Siyasî ya PÊŞVERÛ, hevdîtin bi rêzdar General Mezlûm Ebdê/Fermandarê giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk re pêk anî.

Di gengeşeyê de, pirsa kirîza Sûriyê û rewşa wê bi gelemperî û pirsa guftugoya Kurdî-Kurdî di serê lîsteya kar de bûn û bi berfirehî hatin şirovekirin. Hevdîtinê giringî û parastina diyalogê tekez kir, hêvî û xwestina pêşketin û serkeftinê jê re kir. Herweha, civînê xwest ku diyalog tevahî û giştî be, hemû aliyên Kurdî cihên xwe têde bibînin, da ku ew têkeve rajeya berjewendiya giştî û parastina aştiya civakî û hevrejiyana hemû pêkhateyan.

Herweha, ji bo dîtina çareseriyeke aştiyane ji kirîza Sûriyê re, nerîn û şiroveyên berfireh hatin pêşkêşkirin. Û li ser pêdiviya yekirina xebata hemû aliyên siyasî di vî warî de hate tekzkirin, û garantî ji bo parastina yekîtiya Sûriyê û rizgarkirina xaka wê ya dagirkirî digel çareserkirineke dadmend ji pirsa Kurdî li Sûriyê hate çespandin.

Hevdîtin di merc û hoyên erênî û realist de birêve çû û rêz li hemû nerînan hate girtin.

***Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê***
***Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê(YEKÎTÎ)***

# PENCEŞÊRA KOÇBERIYÊ



**Ehmed Tahir**

Ji sibê heta nîvrojê, ser darê lingê xwe diçû û dihat, were vir û here wir, dawî yê karmend jêre got here sibe were Silo serê xwe hejand û got: gero mêvanê hero, bila seyda, dose ya xwe xist bin çengê xwe de, berê xwe da mal weke yekî dîn ser rê û bin rê dibû, ji xwe re digot xwedê mala we xira bike,agir bi xaniyê we bikev e,we çi bi serê me kir, bavo hema digotin şîr û hinguv e, dînar û dolar in,dane heve,xwezî ew xewn ma ba di serê me de û me bi çavê xwe ne dîtiban e, wax wax me çi bi serê xwe kir, roja em hatin vêderê ji nişka ve veciniqî li ser dengekî dibakir Silêman Silêman li paş xwe nerî ku Hemo û Xemo li pey wî tên, bû tiqtiqa Hemo û got: kuro çi bi serê te hatiye tu ser rê û bin rê dibe, bû kufa kufa Silo weke marekî birîndar û axînek ji dil kişand, piştî silavê li ber sîka dîwarekî rûniştin Silo got: bi serê we zilam e hiş û sewdan di serê min de nema ye ev bû sê meh ev karê min e here û were her yek min dide dest yê din gih esayîş gih UN gih polîs gih qeze û her carekê ji min re dibêjin ma tu sûrî ez dibêjim na, ez kurdê Rojava me Xemo serê xwe hejand û bi dilekî xemgîn û şewitî got: bira ev halê me teva ye,xwezî bi wilo, hema bi xwedê li me dinerin wek em qereçî ne û nandozin Hemo li Xemo vegerand û got: bira qeşmeriya herî mezin dema tu bixwazî herî Rojava ji te re dibêjin ma tu hevalê me yî yan na, bi xwedê ev bû sê sal kebaniya min li ser rê ye lê mixabin rê li ber kesê feqîr û bê pişt girtiye û hin jê heftiyekê li vir in û heftiyekê li wir in ev mesela hizbîtiyê bûye agirek di nav vî miletî de bi dilekî şewitî got, gelo ma hin kurê dê ne û hin kurê jin bavê ne ? Silo got: bê baviya herî mezin ji berpirsê me ye ew ji bilî berjewendiyê xwe pêve tiştek nasnakin,mixabin bûne kelem di pêşiya vî miletî de Xemo di ber xwe de got: tifû li vî zemanî ku... û rawestiya Silo got: bêje bira çi di dilê te de heye, tûrikê xwe vale bike,Xemo li derdora xwe nerî û got: bira bi xwedê ez newêrim bêjim dîwar bi guhin,lê hema di kû ve zirav dibe bila bi qete,kuro ev kûçik bavê ku doh sîxurên rêcîma sûrî bûn û raport bi xelkê hildidan îro tev bûne berpirs vêce de werin safîkin Hemo got: kula herî mezin her roj em tiştekî dibihîzin ku yekî xeswa xwe revandiye yan yekî jinek bi mêr revandiye yan jî yekî yek birîndar kiriye ji bo coka avê, de binerin em ketine çi halî de Silo serê xwe berda ber xwe û keserek kûr kişand û got: bira ma çareserî çiye? Xemo li wî vegerand keko vegere em vegerin welatê xwe bi xwedê kesek ji nêza ne miriye, bila em bimrin bi rûmet, ma çiye jiyana qehr û zilt.

**DUHOK 2015**

# Efrîn... Serdikeve Û Wê Bi Ser Keve...




**Nazdar Hesen**

Belê ... Efrîn serdikeve tevî dagîr, talan û desteserkirina ax û warên wê. ...Biserkeve tevî windabûna mirovatiyê û herikandina xwîna bi sedan keç û xortên wê û belavbûna term û keziyên wan li çol û newalan ... Biserkeve tevî (kirên ) kiryarên herî hov û kirêt bêsûc di dermafê wan de heroj dibin û têne kirin, û tevî penaberî, xizanî, êş û birînan û rê û deriyên lê hatine girtin serdikeve. .. Biserdikeve bi xwendinê û rêjeya serkeftina xwendekarên wê û bidestxistina pileyên bilind di van çend salên cengê de û bi taybetî îsal sala 2020 an serkeftin herî balkêş e û li ba efrîniyan cihê şahnazî û serbilindiyê bû. Ev serkeftin ne tenê dilên bi xem û kederan kizirî yên xwediyên wan hinekî hênik û geş kir, lê ew dilên efrîniyan tev bi vîn û hêviyan geş û şîn kir.

Ji ber ku xwendin hîma sereke ye di avabûna her tiştekî de mirov, civak û welat jî bi rêya wê ava dibin û dibe bingeha pêşveçûn û pêşketinê, ji ber vê yekê, em dikarin bibêjin guhdana efrîniyan bi xwendinê di van rewşên kambax û pir dijwar de, asta zanînê dide xuyakirin û serkeftinê nîşan dide. Belê hêzgirtin ne bi hilgirtina çekan e, çek û hêza herî mezin li ba gelan û bi taybetî li ba gelên bindest xwendin e, xwendin bi xwe re serkeftinê tîne û welatan rizgar dike, ji ber wê jî her ku ast û rêjeya xwendekarên me bilind bin, derfeta serkeftin, roniya pêşerojê, vegerandina axa me ya dagirkirî û bidestxistina mafên me yên rewa nêzîktir û hêsantir dike.

# Hevalê Ebdulkerîm Reşîd Henan (Bavê Rêzan) Oxir be...Cihê te bihuşte be!



Li gundê Hesendêra, devera Çiyayê Kurmênc, sala 1949an, Ebdulkerîm ji dê û bavekî Kurd re bûye. Wî çavên xwe mîna hemû zarokên Kurdan li ser rewşa gelê perîşan û bindest vekirine.

Ji ciwaniya xwe ve, mijûlî doza gelê xwe bûye û li sala 1971ê tevlî rêzên tevgera rêzanî ya Kurdî bûye û di partiya me de bûye endam. Ji bo vê doza pîroz a ku wî awerî pê aniye, bi hemû hêza xwe, bi dilsozî li kêleka hevalên xwe, ta roja dawîn a jiyana xwe, bê dudilî kar û xebat kiriye, ji dost û hevalên xwe ve hatiye hezkirin û rêzlêgirtin.

Ji bo xebatê di ber kufletê mala xwe de, diçe Şama paytext û li wê derê dest bi kar dike, herweha, wî karê xwe yê rêxistinî berdewam kiriye.

Beriya derdora 25 salan, mlatî vedigere Çiyayê Kurmênc, nêzîkî gundê xwe, gundekî biçûk bi navê Baxweşê ava dike û lê dijî.

Mixabin, ji ber nexweşiya ku çend sal berê pê re peyda bû bû, roja Pêncşembê 13ê meha Tîrmeha borî, dilê wî mezin radiweste û can dispêre Xwedê. Di heman rojê de, bi beşdariya gundiyan, bi xemgîniyeke mezin, termê wî, di goristana Hesendêra de tê veşartin.

***Cihê te bihuşta berîn be hevalê Kerîm, serê malbat, dost û hevalên te sax be, tu jibîr nabî!***

# Hevala Gulistan Silêman Silêman (Diya Fesîh) Çû ber dilovaniya Xwedê

Roja Pêncşemê 20.08.2020z, li nexweşxaneya Ferman/ bajarê Qamişlo, endama Rêxistina Jinê ya Partiya me Gulistan Silêman çû ber dilovaniya Xwedê.

Hevala gorbihuşt, sala 1944an jidayik bûye, di malbateke welatparêz de xwedî bûye, ew diya Kurekî bi tenê ye (Fesîh) ku li başûrê Kurdistanê dijî. Ji sala 2004an, ta roja dawî ya jiyana xwe, Gulê kar û xebat di PYDKS de kiriye. Digel temenê xwe yê mezin, Gulê ji civînên xwe yên rêxistinî nedima, û di çalakiyên partiyê de her dem beşdar dibû. Ji ber xebat û dilsoziya wê, ew ji bal rêxistinê ve hatiye xelatkirin.



***Bila Cihê te bihuşt be hevala Gulê, sersaxî ji malbat û hevalên te re!***

# Li Istenbolê Heval Mihemed Me›mo koç kir

Piştî vekirina singê û niştereke dil a têkçûyî li xistexaneke bajarê Istenbolê, roja yekşembê 23.08.2020 , hevalê me yê ciwan û hêja Mihemed Me›mo yê 46 salî, jiyana xwe ji dest da û çû ber dilovaniya Xwedê.

Hevalê Mihemed(Bavê Ciwan) di malbateke welatparêz û Kurdhez de mezin û perwerde bûye, ji sala 1989an ve, bi amanca berxwedan û berevaniyê di ber gel û doza wî ya dadmend de, sala 1989an tevlî rêzên partiya me bûye û bi dilsozî kar û xebat kiriye.

Roja sêşembê 25.08.2020, bi beşdariya gundî, dost û hevalên wî, termê wî li gundê Aşkana Rojava-Cidêrisê - Efrîn hate veşartin.



***Bila serê malbat, xwedî, dost û hevalên wî xweş be û cihê wî bihuşt be.***

# Cendirmên Turkiyê «Xelîl Nîhad Şêxo» li Efrînê kuştin

Li roja Duşemê 3.8.2020an, dema ku «Xelîl Nîhad Şêxo/16/ sal» ê negîhayî, ji xelkê gundê «Vêrganê» - navça Şera li nêzîk sînorê Turkiyê (li aliyê Sûriyê), cendirmên Turkiyê qurşîn kirin û kuştin, di dû re birin nexweşxanak Turkiyê, çend pirojeyên terşandinê (birînkirin) li govdê wî çêkirin. Û li gor hin bînedanên merivên wî, guhestinên alavên hevgîhandinên civakî, rêxistin û komeleyên mafwerî û hebûna dirûtinê li ser stûyê wî - li gor wêneyeke belavkirî -, hin endamên wî hatin dizîn. Û pişt re, termê pakrewan bo xwediyan hate radestkirin, û di goristana gund de hate binaxkirin.





# Dadegeh û qîj-vîj çarê dibînin?!

**Melek Şêx Murad**

Di sala 2011 an de, dema ew xişim û bêtara ku di bin navnîşana şoreşê de li serê gelê Sûriyê herkiye û bi hezaran terorîst ji hemû derverên cîhanê mîna Da,îş û Elqaîdê û h.w.d bi piştgrî û serkêşiya serok komarê Tirkiyê Erdoxan dijiminê Azadî , Aştî û biratî – dostaniya gelan ligel dûfçilên wî ji îslamên redîkal bi navê Oposisyona Sûriyê li hevdu dixurcilîn û dek – dulab digerandin. Lewre jî ,wan bi hêzine mezin û kînên giran piraniyên bajar û gundên Sûriyê kavil û wêran dikirin.

Bi vê awî Erdoxan weke keyseke girîng ji xwe re didît , ku ew karibe xewnên bapîrên xwe bi dagîrkirina xaka Sûriyê ser û ber vejîne , ev li hêlekê û li hêla dî jî hebûna gelê kurd li Sûriyê jî tarûmar û tune bike. Vêca jî, tu carî wî tebat nedidît û ewî bi her hawî pilanên xwe bi şev û roj digerandin û ava serê kurdan li kuç dikir. Zor mixabin hêzên navnetewî û digel herdu dewletên mezin û xwedî hêz Rûsiya û Emerîkan li pêş kiryar û têrorîstiya Erdoxan û dûvçilan, xwe kerdikirin û çav dadimrandin!. Loman jî, ew lal û bê deng diman, tenê wan dida pê şopa berjewendiyên xwe!...

Wisan jî bajarê Aşîtî û zeytunan Efrîna Rengîn di 18 . 3 . Sala 2018 an de dihate dagîrkirin bi çavsorî û bi kinên kufikî hemû gund û bajarok ji hemwelatiyên resen vala dikirin û kesên biyanî ji Tirkiman û Ereban tê de cî war dikirin. Bi sedan girtin, dizî, talan, kuştin , revadina jin- keç , xort, mêr ta destdirêjiya kal û pîrên reben jî dikirin.

Di wa zexet û kiryarên nemirovane de, hê jî ew berdewam in, bi sedan darên Zeytûn û zevî dişewtandin, şûnwarên kevinar hildiweşadin û h.w.d bi wê tenê nedikirin Girêspî û Serê kaniyê jî didane ber xwe û paşê jî li Şengalê, ew hê jî li ser ya xwe mane û li serê xwe suwar in, ku xewinên xwe û bavpîran pêk bînin !.

Li encama ev êş, jan û serpêhatiyên giran, vê yekê dihişt ku, birek mezin ji kurdên me xwe li deriyên sînor û tehlûkeyan dixistin da ku karibin zar û zîçên xwe ji kuştin, bivetî û birçîbûnê rêzgar bikin, em bi va awî bi ber bayê reş diketin û weke nok û nîskên li tehitê ketine li seranserî dever û Dewletên Cîhanê dipijiqîn , meşexite û penaber dibûn ! .Wisan jî, di warê civakî de, pir kelem û pirsgirêk di riya xelkê me yê penaber de li civaka biyanistanê serî hildidan, ji ber ku civaka berê ya ku em têde mezin û perwerd bûne, sîstema bavê tê de serdest bû!. Lewre jî , em bivên û nevên mafên jinê û rola wê bincil



û winda bû ?! Piraniyên jinan li pêş kiryarên mêran ker û lal bûn, ji ber ku zagonên Sûriya me ne li gor parastina mafên mirovan û nemaze mafên jinan bûn ! Loman jî , rewşa jinê di heyameke ne tendiristî û normal de li ber xwe dida û dimeşî.

Piştî kurdên me li van dewletên Ewropa cîwar dibûn û heyameke nû ji demiqrasî, pêvajok, şaristanî û wekheviyê li pêş xwe didîtin û dipelandin, yanê jiyaneke nû nasdikirin. Lê mixabin û pir mixabin, wan xwe tê de nedidîtin û baş nasnedikirin! . Dema ku jin ev rûdawên şaristanî di hundir malên xwe de nabîne, wa hîngê nakokî di jiyana wê de mazin dibin, ev li hêlekê û li hêla dinê jî, ji ber ku mêrê kurd jî zor mixabin li biyanistanê nikarîbû xwe ji ramanên pûç û vala ku ji sedên salan ve toz û kulxanê li ser palvedane rizgar û azad bikira , ew wek kelem di riya wî de mane, û wî dixine deryak mezin ji nakokiyên curbe-cur û dibin sedema gelek serpêhatiyan, weke rûdawa berdana jinê, ango beredana mêran da ku li vir biborin, jin serdeste li gora zagonên heyî, ew jî berdana mêran roj ji rojê li va biyanistanê pir, zêde û hewişivedide !.

Lewra jî, hilweşandin û wêrankirina malê destpêdibe, ziyaneke mezin di berdewamiya malbatên kurd de peyida dibe!. Zor girînge ku mêr li xwe vegere û zanibe ku dem hatiye guhartin û rêzgirtina zagonên van dewletan jî nas bike û bigre, taku karibe malbata xwe ji hilweşandinê biparêze, û jina xwe weke ortaq û xanima malê li rex xwe bibîne û bipejirîne. Ne jî, li paş xwe piçûk, kêm û nizim weke berê bibîne.

Hişmendo, mêrê malê, hevaljînê xanimê, bavê zariyan pirsgirêkeke weke vê, tu carî weke pêwîste tu berê zanibe û jê re amede be, ku bi hêlbertiyan, qîj-qîja û vepekandina li pêş deriyê dadigeh .....

9

# Bangewaziya jineke Efrînê

**Zelîxan Cimo**

Ev e du sal û nîv in di ser dagîrkeriya Turkiyê û nandozên wê yên Islamî yê cîhadîst ji herêma Efrînê û xelkê wê yê resen re derbas dibe, û herweha jî zêdetirî heyşt heyvan e, Serê Kaniyê û Girê Sipî ji aliyê wan ve hatine dagîrkirin. Di van du sal û nîvan de, hemî şêweyên binpêkirin û tewanên şer û tewanên li dijî mirovahiyê li Efrîna rengîn û birîndar û xelkê wê yên Kurd ên li wir mane ranewestiyane. Ji kuştinê de bigir, ta girtin, revandin, talan û dizîn, qutkirin û hilkirin û şewtandina dar û daristanan, teqîn û komkujî, tarûmarkirina û hilweşandin û destdanîna ser mal û firoşxane û avahiyan, ferzkirina vêrgî û bacan, niştecîkirina



anîndeyên hemî herêmên din ên Sûriyê di malên nişteciyên resen de, qedexekirina nivîsandin û xwendina bi zimanê kurdî, pişaftina kultûr û kevnetora kurdî û tarûmarkirina kevneşopan û dizîna şopeweran, avakirina dibistanên hînkirina Islama ku ew dixwazin û belavkirina çanda tundrew, hildana al û simbolên Turkiyê...Û ta zext û fişarên din ên rengereng li dijî xelkê herêmê, bi hêviya neçarkirina wan da ku, dev ji mal û milkên xwe berdin û ji Efrînê derkevin, û weke dixwazin guhertina demografî li Efrînê çêbikin û Turkirin û Erebkirinê tê de cîbecî bikin, yanê Kurdîtiya wê tune bikin. Û zarok, jin û temenmezinên Efrînê jî ji van binpêkirin û tewanan ne bêpar in, û nimûne bi dehezaran e. Û tiştê van gotinên me tekez dikin jî, bi hezaran raporên çalakvan, komele û rêxistinên mirovî û mafwerî, alavên ragîhandinî û partiyan ên derkerjetine ne. Hema li vê dawiyê di navbera heftakê de, li ser destên destlatên Turkiyê ya dagîrker û milîseyên tundrew ên pêve girêdayî û qafseqetên Kurd ên dikevin bin bandora vê heyama qirêj û tundrewbûnê ev jin û zarok û kalemêr hatin kuştin: Gulê Ferec - gundê Dêrsiwanê, Istêrvan Bakîr, Xelîl Şêxo, Bekir Şêx Salih û temenmezin Nûrî Şeref Cimo ji gundê Şadêrê û jineke penaber ji Idlibê. Û zincîra binpêkirin û tewanan ta dagîrkeriya Turkiyê heye wê berdewam be. Vêca gelî siyasetmedar, nivîskar, çalakvan, rewşenbîr, partî, çarçew, Rêvebiriya Xweser û her kesê Kurd ê bi şeref û rûmet, Efrîn li ber tunekirin û pişaftina nasnama wê ye... Ger rast hûn bi gel û doza xwe re dilsoz in û naxwazin Kurd werin tunekirin, li Efrînê, Serê Kaniyê û Girê Sipî xwedî derkevin û ta ji we bê di nêzîktirîn dem de ji nav lepên hovên demê derînin.

---

**Dadgeh ... Dûmahîk**

û mehkeman çareser nabin, bi ser de jî tenê hilweşndina malê ye!. Mixabin birek mezin ji mêran hene hê jî li serê xwe siwar in, wisan jî, ta kuştina jinan li va biyanistanê çi li vir çi li wir, di serî wan de cîh gitiye!.

Li encamê, bêgûman ziyaneke mezin bi holê dikeve, akam û bandora xwe ya neyênî li ser berdewamiya malbatê û zariyan di civaka kurd li biyanistanê de, nemaze li ser duhatiya mendal û zarokan çêdike, ev li hêlekê, û li hêla dinê jî, bêgûman birek ji jinan hene ew jî zagonên Ewropayê ji xwe re weke fersend dibînin, heyf û tola xwe ya ji kevnarên salan ve li ba wan li dijî mêran mane dibînin, îro dem hat ku tola xwe li va biyanistanê hilînin!!.

Herwisan, ew bi destên xwe malên xwe hildiweşînin û rola xwe weke dayîk ji bîra dikin, ku ji erk û stubariya wê ya herî pêşî ye weke jineke kurd hewal bide ku çawa li va biyanistanê li rex mêr raweste, û di riya guftûgo û diyalogê re pirsgirêkên xwe çareser bikin! Weke pêşiyên me gotine : Du serî di beroşekê de nakelin.

Çi û çiqas girînge jin û mêr li rex û kêlek hevdu bin, ne jî li hember û dijî hevdu bisekinin, ta ku va cidahiya di navbera jin û mêr de ji holê rakin, an jî kêm û qels bikin, zar û zîçên xwe di heyameke tendurist de mezin û prewrde bikin, û kesatiyeke kurdî di hundir zarokên xwe de biçînin, ta ku ew jî zimanê dayîka xwe ji bîra nekin. Wa hîngê, ew zar û medalên me, ew nifşên nû gihayî, berhema jin û mêran, karibin jiyaneke durist, xweş û geş biborînin, û bi rola xwe ya naskirî rabin.

Dîsan dixwazim bibêjim, jin û mêr, herdu hevdu temam dikin, li dawî pêwîst e em gotinên bapîrên xwe jî herdem bînin ziman û ji bîra nekin : Dewlet li kuye, li devera tifaq e! …

Ma gelo xwendevanê gotara me çi dibêje, we jî got erê?!!

## Rûpelek ji dîroka Kovara PIRSê…

# Ragihandin Ji bo parastina aştiya cîhanê

**Newaf Abdullah***

**Komîta Amadekar…**

**Xwişk û birayên beşdar…**

Li dawiya sedsala 20an, ji ber sedemên pêşketina pîşesazî, bijîşkî û zanistiyê li cîhanê, dawî li gelek nexweşiyên zarokan û hin cûreyên derdên bê derman hatiye. Xwarin û ava paqij a vexwarinê berdest û peyda bûye, û ji ber tunebûna programên birêkxistina malbat û civakê li deverên rojhilatê, nemaze li Asya û Afrîkayê, hejmara mirovan gihaye 7 milyar û 366 milyon î...


Ji bo peydakirina pêdiviyên jiyanê ji vê hejmara mezin a mirovan re, li Emerîka, Rûsya û dewletên rojava, bi hizaran fabrîqeyên mezin bi şev û rojê xebitîne û hê jî dixebitin, gelek dû, dûman û teniya reş a ziyankar berdidine atmosfera me, bax û daristananên mezin têne birrîn, ferehiyên keskiyê ji holê radibin û kêm dibin, jîngeha me ya pak gemar û genî dibe, tîna gogzemînê bilind dibe, sal bi sal erd û asman hişktir û ziwatir dibin û jêderên avê jî kêmtir dibin.

Ji hêleke din ve, rijêmên hov ên totalîter li gelek deverên cîhanê dest danîne ser semyana gel û welatên xwe, welatî birçî, tazî, nezan û xizan hiştine. Dergehên xwendinê li ber zarokan girtine, nezanî û nexweşiyên civakî yên wêranker belav bûne. Evê rewşa kambax, rê li pêş geşbûna nerînên nijadperest û hişkbawer dûz kiriye, nirx û pirensîpên mirovatiyê berepaş û têkbiriye, hiştiye ku mirov tenê li serê xwe bigere, haj rewş û pergala birayê xwe yê mirov nemîne!!…

**Xwişkino, Birano..!!**

Mixabin ku îro di siha kerlalbûna civaka navnetewî de, li devera rojhilatê, hawîr pevçûn û şer e, xwîna mirovan li kolanên gund û bajaran bê şerm û bê fihêtî diherike, karbidestên hov, bi hemû çekên giran gel û welatên xwe dipelêxin, dişewitînin û agirê kîn, zikreşî û berberiyê di nav rêzên mirovan de gur û belav dikin. Dîsa mixabin ku îro, asta tund û tûjiyê pir bilind bûye. Bi kurtî, mirov dikare bibêje cîhana me ya îroîn li hemberî qeyran û astengiyeke sincî û aborî rû bi rû bûye, ew çareseriyeke zanistî navnetewî ya lezgîn dixwaze. Eger ev problem çareseriyê nebînin, berê cîhanê ser û ber li şer û pevçûnê ye, paşeroja me hemiyan dikeve goman û tariyeke kûr a bê sînor..!!

Rola ragihandinê a ku îro mijara kongira we ye, ji bo parastina aştiya cîhanê roleke sereke ye çimku ew serdest e, tu sînor û dîwar li pêşiya wê tune ne, bi hêsanî û rengekî ji rengan derbasî her malekê bûye. Vêca, ji rêxistinên siyasî, komelên mafên mirov, rewşenbîr, pispor û aqilmendên cîhana me tê xwestin ku ew çanda mirovhezî, dadmendî û wekheviyê di alavên ragihandinê de li tevaya cîhanê belav bikin, şerxwaz û neyarên




mirovatiyê, bazirganên şer û diktatoran şermear, rûreş û riswa bikin, mafên jin û zarokan biparêzin. Her wiha tê xwestin ku civaka navnetewî rêxistinên xwe bi rengekî nûjen saz bike, maf û azadiya gel, kêmnetew û rêolan biparêze û bingehên jiyaneke aştiyane û aram, jiyaneke bê xwîn û bê kuştina mirovan saz bike. Ta wê rojê:

-Xebat ji bo azadî, wekhevî û parastina aştiya cîhanê!

-Pêşketin û serkeftin ji çanda mirovheziyê û hevgirtina gelan re!

Û serkeftin ji kongireya we ya pîroz re.

**** Gotina Kovara PIRSê di «Dîdara Midyakarên Başûr û Rojavayê Kurdistan li Dihokê de», (5- 6).12.2012an.***

---

## Qubleta şîndar û dilekî ji Ar!

**Hêmen Kurdaxî**



*
Îro sedsal e,
sedsal jî Sêdar e.
Dilê bê Efrîn
Agirekî lidar e!
**
ji hêrsa ku; nebûn jê;
li çavekî min ketî,
delav bûn belav û
kesk bûye şîn.
Çavê minî din;
Gerdûn dayî zayîn!
Li aliyekî Perzerik
biref çûnfirîn
Li hêlekê, liser wê
kaxizê,
Axa Sor;
Gewriyekî çiyayî,
Efrînek aferîn.
***
Sê qublet, Qublet jî Ar!
Sê Mirin; mirin jî ew
Dar!
Hêsir… Hêsir…
Hêsir…
Piştî sê mirinên girîndar,
Ji Hêsran jî mam e jar!
***27.07.2020 Tossens***

# Xintik Û Çirtik

**Osman Îso**



-Roj baş Xintikê min, te xêre tu bi ser xwe de dinalî wek wê mirîşkê ço li sêrî xistine.

-Roj baş Çirtikê min welle ez ne bi kêf im. La Beran, Zinar, Debûr, Tefşo, Bêrik, Mêrik la ta Misas giş bi jor ketin û ez bi tenê li jêr mam. La Çirtikê min kesî nan tunebû bixwara, la qurşî qul di berîkê de tune bû anha bûne Kont û bi wa mêratî dilîzin...

- La fedî ke la tema tu mestmezin î, la qe ne şerm e .

- La te xêre law tu wek wa dolabî serberdayî derbekê tu filitî, la me çi got?!!



- La tu gotinên bin filitî dikî ew çi mêrate tu dibêjî.

- La qurban ez çêrê Dolêr dikim dolêr, ma qey hefsar in şoran hene, te bi ku de ajotin wê de derin ...berde wan şorên boş tu çawayî Çirtikê min.

-La qurban ez wek navî xwe me, rojek reş bû ew roja nav li min kirin Çirtik, qederê min jî bi çirtik e, sêwî ez sêwî me, belengaz ez belengaz im , bêkes ez wek miletê xwe bêkes im ,birayên min mîna welatê me hatine parve kirin, her yek li welatekî ye, carina alîkariya min dikin lê di vir re ez peran dibim û hîn negîhame mal ev bênamûs ne li benda min in, welle bîlle ez rişkîn kirim ...em bi ku ve herin welle dirêj kir, la ne bes dirêj kir pir û pir dirêj kir va kirîzê ne bes mal, malbat, avahî, berîk, daristan, goristan û laşê mirovan tev ji ber hev şelandin ....

- Tu zanî birayê Çirtik çima em jî ewkî xwe çê nakin?

- Ew çî ye law? Hew çi ew e.

- La ew ew, wanê çêlikan dikin.

- Medcenê mirîşkan!!!

- Na na la axnemez mirîşk hêkan dikin.

- Erê erê rast e, law ker? Bizin? Çêl çêlikan dikin, bes çêl gelekî biha ne û ker jî tabî ji berê pirtir bûne lê ew jî biha bûne...

-La Çirtikê min ew çi ker in?!!! Ma tim ker di serî te de ne, tiştek navê wan mîna (pirtiyan ne - Nivîn-).

- Law dîwane çi pêwendî di navbera pirtiyan û çêlikan de hene!!!

- La navî xwe nêzî pirtiyan ne, ha ha jê re dibêjin: Huzib - Yaw navê xwe partî ye, partî.

- Eywa bidê medê te di çehvîk de lêxist.

- La Çirtikê min eger em jî yekî çê kin wek wayî te nav gotî tu zanî emê ço di peran vekin û çiqas derî wê li pêş me vebin û emê pê bilîzin, dûr me re emê bi doleran wek meymûnan bilîzin qurban Bes çavên xwe damrîne û bi peran û duruşma (P.X.Ç- PARTIYA XINTIK Û ÇIRTIK) Birame.

- Xintikê min tu jî çavên xwe damrîne û bi Zêtûnên hatine birîn û şewtandin, komkujî, dizî, talan, desdirêjî, binçavkirin û zîndan û kuştina kal û pîran birame...... Xintikê min tu yê zengîn bibî û bi peran bilîzî, û gelek derî wê li pêş te serbest vebin lê deriyê mirovahiyê wê li pêş te were girtin Xintikê min ji bîr meke eger kûçik werne qusandin nabine tajî, werne talîkirin (qelew) nabine qurban.


# Li Ewropayê Pirtûkek Kurdî ya nû hate weşandin

Ji bal çapxana Sersera, û pêşgotina birêz Dr.Mihemed Zeyno, pirtûka nivîskar û xebatkarê Kurd ê navdar birêz Bilal Hesen (Çolbir), ya bi navnîşana 7 Heft ji hejmarên hêzdar hatiye çapkirin.

Hêjayî gotinê ye ku ked û xebateke nivîskar Bilal Hesen di dewlemendkirina pirtûkxana Kurdî de heye û ew xwedî berhem û dîrok e. Di vê pirtûkê de, birêz Bilal Hesen li ser wate û cêgeha hejmara (7) li nik gelên cîhanê bi gelemperî û gelê Kurd bi taybetî radiweste, ji stran, folklor û efsaneyên Kurdî her tişt û bûyerên bi hejmara 7 ve têkildar şirove kiriye û li ber destê xwêner daniye.

Pirtûk ji 115 rûpelan hevedûdanî ye, li Almanya-Berlîn hatiye çapkirin.

Spasî ji wan kesan re ku ji bo afrandina vê pirtûka nirxdar alîkarî pêşkêşkirine, û cefa kişandine.(Dr. Mihemed Zeyno-Dr. Mamed Cimo, Hunermend Yehya Silo, mamoste Elî Cefer, mamoste Şêxmûs Mihemed keferomî û Dr.Bişar Mustefa).



# Di 69 -emîn salvegera Koçkirina Mîr Celadet Bedirxan de Gurzek Gul û silav...

**Desteya NEWROZ**



Mîr Celadet Alî Bedirxan, roja 26.06.1893an, li bajarê Istenbolê ji dayik bûye û di malbata Bedirxaniyan a bi nav û deng ku mîrîtiya Kurdistanê kiriye mezin û perwerde bûye. Li ser destê zaniyarên mezin, nivîskar û helbestvanên navdar ji kaniya zanînê ya zelal vexwariye. Herweha, di civatên Mîr de, li dengbêj, çîrokbêj, sazbendî û folklora Kurdî guhdarî kiriye, û fêrî çanda Kurdî ya resen bûye. Kurdayetî û hezkirina zimanê Kurdî, bi şîrê dayika xwe re mêtiye.

Ji ber sitema dewleta Turkiyê li vê malbata Kurd a welatparêz, Mîr Celadet û Kamîran ji Turkiyê derdikevin, li Almanya cîwar dibin, li zanîngeha Miyûnixê, mafnasiyê dixwîne û dibe parêzer.

Mîrê gewre, li Şamê, paytexta Sûriyê ciwar dibe, dest bi xebataSiyasî dike, li gel mezin û girgirên Kurdan, Tevgera Xoybûnê dadimezrîne. Lê piştî şikestina serhildana Agirî, dest bi xebata çandî û wêjeyê dike.

Li Şamê, roja 15ê Gulana 1932an, yekemîn car di dîroka gelê Kurd de, bi zimanê Kurdî û Elfabeya Kurdî ya Latînî, hejmara Yekê ji Kovara HAWARê çap û belav dike, 57 hejmaran jê û 28 hejmaran ji kovara RONAHÎ diweşîne. Gelek helbestvan û nivîskarên navdar di van herdu kovaran de dinivîsin, yên mîna (Osman Sebrî, Dr.Nûredîn Zaza, Cegerxwîn, Qedrî Can, Mele Ehmedê Namî, Hesen Hişyar...û hwd) ku dilê Kurdan pir şa bûye.

Lî sed mixabin ku Mîrê me zû ji nav gelê xwe bar dike, xatirê dawî dixwaze, ku roja 15ê Tîrmeha 1951ê, di bîra Qederê werdibe, jiyana xwe ji dest dide, li pey xwe gelek şagirt û hezkerên ziman û çanda Kurdî dihêle!

Cihê te bihuşta berîn be Mîrê me, em te jibîr nakin!

# Dîmenek ji Çemê «Ceqceq» li Qamişlo

**Desteya NEWROZ**

**Xwendevanên rêzdar…**

Beriya 50 salî, ev çemê perîşan ê ku hun wî di vê belengaziyê de dibînin, çemekî zengîn, xêrdar, mezin û herikbar bû, hemû werzên salê, bi ava xwe ya zelal ew diherikî, bi comerdî, dehil, zevî, birinc û garisên xelkê avdida. Ne tenê wilo, li taxa Enteriyê aşekî avê bi navê aşê Samo ku bi navê xwediyê xwe yê xiristiyan hatibû binavkirin hebû, gundî û xelkên deverê ard û savarê xwe lê dihêran, bi saya vî çemî digeriya…

Lê mixabin, heta ev çemê bê guneh ji sitem û çavsoriya dewleta Turkiyê bêpar nema ye. Wekî hun dizanin bajarê Nisêbînê ku ji mêj ve ew jî li ser vî çemî hatiye avakirin, hevsînorê Qamişlo ye, hema tu dikarî bibêjî her du bajar bi hev ve hatine girêdan.

Nisêbînê, hemû ava xwe ya serşokan û ava



gemar îro berdide vî çemî ku ziwa û bê av maye, ew ava genî di hundirê bajarê Qamişloyê de bi giranî diherike, êş, nexweşiyên cûr bi cûr û bêhna genî hawîr belav dike, bê ku dewleta Turkiyê hinek avê ji bendên xwe berde, da ku gemara bajarê Nisêbînê li ber xwe bibe, bidûr bixe!.

Lê, wê rojek bê ku di siha destelateke demokrat û welatparêz de, bi guftûgo û diyalogê ev pirs çareser bibe, çemê me jî maf û para xwe ya avê bidestxîne!

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**